

# Birîna reş û êşên bêdawî

*BERIYA* ku ji hundirê odeya rûniştinê derkeve, li milê rastê yê dîwar nihêrî. Li ser dîwar wêneyekî kevin û di tozê de werbûyî yê şoreşgerekî navdar hebû. Wêne yê Ernesto " Che" Guevara (1928-1967) bû. Li jêr wêneyê Che gotineke wî ya balkêş a bi zimanê farisî hatibû nivîsîn. Pêşmergeyekî Komelê di salên destpêka şoreşa gelên Îranê de ew wêne bi dîwarê malê ve kiribû.


*ÊDÎ* wêne mabû li cihê xwe lê ji endamên malbatê pêve nediket ber çavên kesekî. Keça ciwan a malê Neşmîlê li wêne nihêrî û belkî cara hezarê bû ku dîsa ew gotina Che xwend: "Ger mirov di jiyanê de ji xeynî hêvîyê hemû tiştan ji dest bide asayî ye, çimkî hêvî rêya yekê ye ji bo bidestxistina hemû tiştekî..."

*Nivîsa Kakşar Oremar RÛPEL - 6*


# e-rojname

7 Kanûn - În 2018 E-mail: e-rojname@hotmail.com Hejmar: 197


## Êlek Zer ne tenê Êlek Zer in



Li Fransayê ji 17'ê mijdarê ve çalakiya Êlek Zeran berdewam dike. Heta di hin weşanên çapemeniyê de hat diyarkirin ku hikûmeta Manu (Macron) li dijî çalakiyan qebûl kiriye û bihayê sotemeniyê 6 mehan zêde neke. Lê Êlek Zer bi ewqasî razî nabin û ew jî ji eniya xwe ve dibêjin; em hewrikên nan naxwazin em nan dixwazin... *Nivîsa Ramazan Olçen / RÛPEL -4*

# Piştgiriya navneteweyî




## Ev raman bûye ya gel

**Parlamenterê HDP'ê yê Mêrdînê Tuma Çelîk bi rojnameya me re axivî. Çelîk got ku dewlet dixwaze bi tecrîdê re gelê kurd tasfiye bike û wiha got: "Em dibêjin, hûn çiqasî êrîş bikin jî dê nekarin me ji fikra me vegerînin. Ev raman bûye ya gel. Em jî bi çalakiya xwe dixwazin çalakiya Leyla Guven berbelav bikin..."** ***RÛPEL - 3***



### Onder xistin girtîgehê

Parlamenterê HDP'ê yê berê Sirri Sureyya Onder, piştî ku 3 sal û 6 meh cezayê girtîgehê misoger bû, kete girtîgeha Kandirayê. Onder got ku rewşa heyî nebaş xuya bike jî, rojên xweş nêz in.



### 4 leşker hatin kuştin

Çalakiyên gerîla yên li dijî artêşa tirk a dagirker didomin. HPG'ê bi daxuyaniyekê ragihand ku hêzên wan di 5'ê kanûnê de li girê Lêlîkan ê herêma Sîdekanê çalakî pêk anîne û 4 leşkerên artêşa tirk hatine kuştin... *RÛPEL - 3*



### ÇALAKÎ BERFIREH DIBE

Çalakiya greva birçîbûnê ya ku parlamentera HDP'ê Leyla Guven ji bo rakirina tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan daye destpêkirin, mehek li pey xwe hişt. Piştgiriya bi çalakiyê re roj bi roj mezin dibe. Ji qada navneteweyî jî gelek sazî, parlamenter, siyasetmedar û hwd. bi metnekê piştgirî dan.

### BANG LI CÎHANÊ KIRIN

Di metna îmzeyan de bang li raya giştî ya navneteweyî, Konseya Ewropayê û CPT'yê hat kirin ku ji bo rakirina tecrîda li ser Ocalan, bila zextan li dewleta tirk bikin. Her wiha li bajarê Hîldeshîmê jî çalakiya grevê di roja 4'emîn de berdewam dike û li gelek bajarên Ewropayê jî tecrît hat şermezarkirin.

### TEVÎ ÊRÎŞAN ÇALAKÎ DIDOME

Li bakurê Kurdistanê û Tirkiyeyê jî li gelek bajaran çalakiyên greva birçîbûnê yên ji bo piştgiriya bi çalakiya Leyla Guven re berdewamin. Dewleta tirk ku ji mezinbûna çalakiyan di tirse, li Rihayê tehemûla çalakiyê nekir û bi ser avahiya HDP'ê de girt. Di encamê de herî kêm 40 kes hatin binçavkirin... *RÛPEL - 3*

### Astana jî têk çû



*Ahmet AKTAŞ - R.3*



## Li meclisa Iraqê alozî

**Roja sêşemê li parlamentoya Iraqê ji bo diyarkirina 8 wezaretên kabîneya Adil Ebdulmehdî yên mane diyar bikin, kom bû. Lê ji ber nakokiyên li ser namzetan û wezaretan alozî çêbû û parlamenteran dest li hev rakêşan. Nakokiya sereke jî li ser wezareta navxweyî û wezareta parastinê bû...** ***RÛPEL - 4***

## Giyanê didin çanda kurd

Li Kurdistanê ji demên berê heta niha jinan bi çêkirina poşî, parzîn, şûtik û xurcikan çanda kurdewar heta roja me anîne. Dayika Hacer Engîn jî bi salan e bi çêkirina poşî, xurçik, şûtik û parzînan hem debara xwe dike, hem jî destûr nade ku çanda kevnar winda bibe. Engîn diyar kir ku ew ji zarokatiya xwe heta niha bi pêşxistina çanda berhemên destan mijûl e... *RÛPEL - 2*





## *Mesele bi hepskerdiş çareser nêbeno*

Paştîdayîşê grevê Leyla Guvene zêde bena. Şarê Colemêrgî paştî dano Guvena ke zîndan de seba wedartişê tecrîdê serê Ocalanî grevê vêşanîye de ya. Hemwelatijan vatî: "Waştişê Guvene waştişê ma pêrunan o. Ganî tecrîdê serê Rayberê ma bêro wedartene." *RÛPEL - 5*

www.arsivakurdi.org



## Li Qamişloyê semînera li dijî tundiyê hat lidarxistin

**QAMIŞLO -** Partiya Sûriyeya Pêşerojê der barê tundiya li dijî jinê de li Navenda Mihemed Şêxo ya Qamişloyê bi dirûşma 'Ber bi pêşerojeke bê tundî ve' semîner li dar xist. Endamên hemû saziyan û gelek jin beşdarî semînerê bûn. Di semînerê de hat diyarkirin ku tundiya li ser jinê tundiya li ser hemû civakan e loma divê dawî li tundiya li ser jinê bê. Her wiha semîner bi çalakiya wêneyên jinan ên ku tundî li wan hatiye kirin ên ji aliyê Emel Etar, Cela Hemzawî Zehra Bedewî û Semira Hesen ve hatine xêzkirin bi dawî bû.

# Berhemên kurdewar bi destê jinan tên çêkirin

*Ji berê û heya niha li Kurdistanê jinan bi karên destan berhemên herî xweşik derxistine holê û bi vî awayî çanda kurdewar parastine. Hacer Engîn ku ji zarokatiya xwe heta niha bi çêkirina karên destan mijûl e, diyar kir ku ji bo ev çand winda nebe dê heta dawiya temenê xwe bidomîne*



**Zeynep DURGUT / COLEMÊRG - JINNEWS**

Li Kurdistanê ji demên berê heta niha jinan bi çêkirina poşî, parzîn, şûtik û xurcikan çanda kurdewar berdewam kirine û heta roja me ya îro anîne. Dayika Hacer Engîn bi salan e bi çêkirina poşî, xurçik, şûtik û parzînan hem debara xwe dike, hem jî destûr nade ku çanda kevnar winda bibe.

Engîn diyar kir ku ew ji zarokatiya xwe heta niha bi pêşxistina çanda berhemên destan mijûl e û got ku divê jin destûr nedin ku çanda kevnar winda bibe.

Engîn anî ziman ku wê li dijî hemû zehmetiyan dev ji çêkirina karên destan bernedaye û da zanîn ku çanda berê bi watetir bû û wiha domand: "Ez ji zarokatiya xwe heta niha bi çêkirina parzîn, şûtik, xurçik û poşiyan re mijûl im. Gava ku em li gund bûn her me berhemên destan çêdikirin. Me bi çêkirina berhemên bi destan hem debara xwe dikir û hem jî berhemên herî xweşik derdixistin holê. Piştî ku gundên me hatin valakirin, em ji neçarî hatin bajaran. Lê piştî ku em hatin bajêr jî min karê xwe berdewam kir. Niha di vê odeyê de ez tenê hilberîna karên destan dikim û min vê odê bi berhemên xwe xemilandiye."

**'Karê destan sebrê dixwaze'**

Di axaftina xwe de Engîn destnîşan kir ku çêkirina van berheman kedek mezin dixwaze û wiha pê de çû: "Ez destpêkê rengê herî xweşik hildibijêrim û piştre dest bi kar dikim. Ji bo ku berhemên herî xweşik mirov derxîne holê, pêdivî bi rengên herî xweşik heye. Çêkirina karên destan bi rastî pir zehmet e. Ev kar kedeke mezin û sebrê dixwaze. Çêkirina parzînekî rojan derbas dike. Ev parzîn ji berê de ji aliyê bêrîvanan ve ji bo parzinandina şîrê pez û zarokan dihat bikaranîn. Li herêma Colemêrgê ev çand bi salan e hebûna xwe didomîne. Poşiyên vê herêmê li tu deverê nayên dîtin. Di demên berê de gava ku jinek bê poşî dihat dewetê tu kesî ji wê re rêz nedigirt. Ji ber ku jinan bi poşiyên xwe dawet dixemilandin û çanda wan bû. Rengên ku di poşiyan de dihatin bikaranîn ji wan nexşên xweşik dihatin çêkirin û cihê kêfxweşiyê bûn. Ji ber wê poşî li cem me pir bi wate ye. Niha jî ev çand berdewam e."

**Bi çêkirinê aram dibe**

Her wiha Engîn da zanîn ku dê heta dawiya temenê xwe vê çandê bide domandin û axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Gava ku ez berhemên bi destan çêdikim ez xwe aram hîs dikim. Ev kar min ber bi bîranînan ve dibe. Ji ber wê ev kar ji bo min gelek bi wate ye. Em bi saya vê çandê heta roja îro hatine. Her xweşî û nexweşî bi van berheman re zindî bûne. Di van berheman de bikaranîna rengan jî xwedî wate ye. Ji ber wê jî divê her jin di berdewamkirina vê çandê de xwe berpirsiyar bibîne."

# Bi hevkariyê nan çêdikin û debara xwe dikin

Komek jinên Helebçeyî ji bo debara jiyana xwe bikin, dest bi karên komunal kirin. Li taxa Şehîdan a bajarê Helebçeyê jinan cihekî nanpijandinê vekir. Di vî cihê kar de hem ji bo pêşxistina peywendiyên xurt bi hev re û geşepêdana têkiliyên civakî, hem jî ji bo debara xwe bikin û di warê aborî de bi temamî girêdayî mêr nemînin bi xwe hinek derfetên kar ji bo xwe ava dikin. Ev koma jinan ji 10 kesan pêk tê û ji aliyê jinek ve tê birêvebirin.

Jin gelek cureyên nan ên herêmî çêdikin. Nanê tîrê, nanê Hewramî, nanê ceh, nanê sêlê, kulîçe, şîrînî û gelek cureyên din ên şîrînî û nan çêdikin.

Di nava her xurfeyekî de jinek cureyeke cuda ya nan çêdike. Ji derveyî nan gelek xwarinên herêmî yên kurdewar jî li aliyê jinan ve tê çêkirin.

Der barê mijarê de jinên ku karê çêkirina nan dikin, axivîn û diyar kirin ku divê jin bi keda destê xwe debara xwe bike û muhtacî tu kesî nebin. *HELEBÇE*



## Hejmara nû ya kovara **Yenî Yaşam**ê derket

Hejmara nû ya kovara Yenî Yaşamê ya ku ji aliyê Meclisa Jinên Sosyalîst ve tê amadekirin, derket. Di kovarê de dirûşma 'Azadî li kuçeyan, bi serhildanê û bi xweparastinê pêk tê' derket pêş. Di kovarê de tê gotin ku hêza jinan bi hev re zêde dibe û serhildana hevpar girîng e. Her wiha di kovarê de jin daxwazên xwe ... Her wiha di kovarê de jin daweti hevdîtina mezin a dê di 5-6'ê çileyê de pêk were, tên kirin.


Di hejmara nû ya Yenî Yaşamê de jin tecrubeyên xwe parve dikin. Di kovarê de roportajek bi serhildêrên Flormarê cihê xwe digire û banga piştevaniyê tê kirin.

**Nameya Namme jî cih digire**

Kovara Yenî Yaşamê cih da nameya Namme Ozturk a ku mêrê ku dev jê berda kuşt û 12 sal û 6 mehan ceza lê hat birîn. Ozturk tiştên ku jiyaye vedibêje û dibêje ku ew bi saya piştevaniya jinan zûtir bi ser xwe ve hatiye û bang kir ku ev piştevanî zêdetir bibe.

Di kovarê de nivîsa bi navê 'Qeyrana Burs-Kredî' ya ku pirsgirêkên xwendekaran vedibêje cihê xwe digire.

Her wiha nivîsên bi navê 'Qeyrana aborî', 'Îstismara zayendî' û 'Ev beden ya me ye' jî cihê xwe di kovarê de digirin. *AMED*



## Meclisa gundê **Jinwar** hate avakirin

Gundê Jinwar ku di 25'ê Mijdarê Roja Têkoşîna Li Dijî Tundiya Li Ser Jinan a Cîhanê de hate vekirin û dest bi xebatên rêxistinî kir û niha jî meclisa xwe ava kir.

Der barê mijarê de berdevka gundê Fatma Derwîş axivî. Derwîş diyar kir ku dê karê gund bi awayekî komunal bê kirin û wiha got: "Piştî gund hat vekirin jinên li gund bi awayekî hevbeş kar parve kirin. Wek karên parastin, çandinî, çêkirina xwarinê û hwd. ji aliyê jinên ku li gund dimînin ve hatine parvekirin. Meclis dê her hefte civîna xwe li dar bixe û her meh kom bibe û karên xwe biguherînin. Dîsa di heman demê de dê perwerdeya ji bo xwenasîna jinan bên dayîn û rewşa jinan tê de bê gotûbêjkirin."



Her wiha Derwîş got ku di heman demê de deriyê gund ji bo gelê gundên derdorê jî vekirî ye, ew dikarin zarokên xwe bînin dibistana gund, ji firina gund nan bigirin û tev li perwerdeya gund bibin. *HESEKÊ*

## 'Divê em li dijî tundiya mêr têbikoşin'

Qanûna hejmara 6584 ku jinan li dijî tundiyê diparêze, ji aliyê desthilatdarî û çapemeniya alîgir ve hedef hatiye girtin. Ji Parasina Jinê Fulya Dagli cureyên tundiyê, tiştên divê bên kirin û girîngiya 6284 vegot.

Dagli anî ziman ku tundî ne tenê fizîkî ye û wiha got: "Bi giştî pêkanîna tundiya mêr ji bo jinan bikin bin kontrolê û ceza bikin pêk tê. Vegotina tundiya fizîkî hêsantir e lê ya derûnî zehmettir e. Em dikarin heqeret, biçûkxistin û qêrînê jî mînak bidin."

**Cureyên tundiyê**

Di axaftina xwe de Dagli bal kişand ser tundiya zayendî û diyar kir ku tacîz û tecawiz di tundiya zayendî de tê hişê mirovan lê her tiştên ku daxwaz tê de tune be di nav cureyê vê tundiyê de ye û wiha pê de çû: "Cureyek din a tundiyê jî aborî ye. Keda jinan ji aliyê mêrên li heman malê pê re dijî tê binpêkirin. Li cihên ku jin bi pere dixebitin jî ji aliyê patronan ve tên binpêkirin. Kontrolkirina ku jinekê çiqas pere li ku xerc kiriye, nedayîna pereyan û astengkirina perwerdeyê jî tev li vê ye."




Her wiha Dagli destnîşan kir ku tundiya flortê jî di roja îro de pir pêk tê û axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Partner hewl didin jinan bi awayekî bikin bin kontrolê. Ev rewş dikare di alî derûnî û zayendî de pêk bên. 4 astê tundiyê hene. Pêşî alozî tên jiyîn, piştre tundî tê jiyîn dûre lêborîn tê xwestin û herî dawî jî weke ku qet tundî nehatiye jiyîn tev digerin, hewl didin li hev bên. Ger rasterast tundiyek hebe divê ji derdorê alîkarî bê xwestin û mudaxale bê kirin. Pêkan be divê mirov berê mexdûran bide rêyên hiqûqî û torên piştevaniyê." *STENBOL*

## Di ragihandinê de baviksalarî hatiye avakirin



Yekîtiya Navnetewî ya Jinan a Televzîyon û Radyoyê li ser rola jinan a di ragihandinê de û pirsgirêkên ku jin di ragihandinê de dijîn semînerek li Silêmaniyê li dar xist. Di semînerê de hat gotin ku her tim di ragihandinê de bi çavê duyemîn li jinan tê nihêrtin.

Di civînê de hat diyarkirin ku bandorek mezin a hizb û desthilatan li ser ser ragihandinê heye, ji ber ku desthilatan di ragihandinê de çandeke baviksalar ava kirine û hat destnîşankirin çawa ku di nav civakê de cudakarî di nav jin û mêran de heye, di ragihandinê de jî ev yek tê kirin. *SILÊMANÎ*

# HPG: Li Lêlîkanê 4 leşkerên dijmin hatin kuştin

Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê derbarê çalakiyên gerîlayan de daxuyaniyeke nivîskî weşand. HPG'ê diyar kir ku hêzên wan roja 5'ê kanûnê li herêma Sîdekanê ya başûrê Kurdistanê li dijî artêşa tirk a li ser girê Lêlîkanê çalakiyeke pêk anîne û ev agahî parve kir: "Derbên giran li çeperên dijmin ên li ser gir hatin xistin û di encamê de çepereke dijmin hate rûxandin û 4 leşkerên dijmin jî hatin kuştin. Hêzên me heman rojê saet di 15:00'an de careke din li leşkerên li ser girê Lêlîkanê xistin. Di vê çalakiyê de ku derb li çeper û stargehên dijmin hatin xistin, kuştî û birîndarên dijmin çêbûn lê agahiyeke zelal bi dest neket. Her wiha 4'ê kanûnê saet di 13:50'ya de derdora gundê Şêlazê yê bajarê Zaxoyê hat bombekirin. Ji ber bomberdûmanê zirar li dehl û rezên gundiyan bû û tu zirar negihîşt hêzên me." ***BEHDÎNAN***

# Li dijî tecrîdê piştgiriya navneteweyî

Ji qada navneteweyî ji bo daxwazên Leyla Guvena di greva birçîbûnê de piştgirî hate dayîn. Di metna îmzeyan de hate xwestin ku tecrîdkirina Ocalan biqede. Her wiha ji Kurdistanê heta bajarên Ewropayê kurdistanî û dostên wan li dijî tecrîdê di nav çalakiyan de ne

Parlamentera HDP'ê Leyla Guven ji bo bidawîbûna tecrîdkirina Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan dest bi greva birçîbûnê kiribû. Piştgiriyên ji bo Guven û rakirina tecrîdê her diçe berfireh dibe. Di çarçoveya vê yekê de ji qada navneteweyî gelek sazî, rojnamevan, parlamenter, siyasetmedar û rewşenbîran bi metnekê piştgirî dan daxwaza Guven.

Di metna îmzeyan de ev tişt hatin gotin: "Parlamentera HDP'ê û hevseroka KCD'ê Leyla Guven di 7'ê mijdara 2018'an de dest bi greva birçîbûnê kir. Guven diyar kir ku ew tecrîdkirina Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan protesto dike. Ji 27'ê tîrmeha 2011'an û vir ve destûr nayê dayîn ku parêzerên wî biçin serdana Ocalan. Der barê tenduristiya Ocalan de tu agahî nayên standin. Em bang li raya giştî ya navneteweyî, Konseya Ewropayê û Komîteya Pêşîlêgîrtîna Îşkenceyê dikin ku ji bo rakirina tecrîda li ser rêzdar Ocalan bila zextan li Tirkiyeyê bikin. Di heman demê de em hestên xwe yên piştgiriyê jî ji Leyla Guven re dişînin."

Navên kesên ku metnê îmze kirine wiha ne: Dr. Nadje Al Alî, Maxîne Peake, Dr. Thomas Jeffrey Mîley, Brûce Kent, Dr. Derek Wall, Chrîstîne Blower, Amber Hûff, Vîctorîa Brîdges Margaret Owen OBE, Cynthîa Cockbûrn, Lord Rea Lord Dholakîa Hywel Wîllîams (Parlamenter) Tommy Sheppard SNP (Parlamenter) Chrîs Stephens SNP (Parlamenter), Dr Phîlîppa Whîtford SNP(Parlamenter), Ronnîe Cowen (Parlamenter), Rûskell M (Mark), Ross Greer, John Fînnîe, Jean Lambert, Jîll Evans, Jûlîe Ward, Martîna Anderson, Lîadh Nî Rîada, Lynn Boylan, Matt Carthy, James Kelman, Dr. Rad haD'Soûza, Nîck Hîldyard, Lîndsey German, Gareth Peîrce, Janet Bîehl, Rahîla Gûpta, Sîmon Dûbbîns, Clare Baker, Dîrk Campbell, Meredîth Tax, Maryam Namazîe, Prof Karîane, Westrheîm Sarah Parker, Dr. Sarah Glynn, Stephen Smellîe, Doûg Nîcholls, John Smîth, Lîz Savîlle Roberts (Parlamenter), Jonathan Edwards (Parlamenter), Ben Lake (Parlamenter), Leanne Wood, Helen Mary, Jones Llyr, Grûffydd Bethan Sayed, Daî Lloyd Penny, Clara Osagîede. ***BRUKSEL***



## Çalakiyên li dijî tecrîdê didomin

Li gelek bajarên Ewropayê kurdistanî bi çalakiyên xwe tecrîda li ser Ocalan şermezar dikin û piştgirî didin çalakiya Guven.

Bi vê armancê li bajarê Hîldesheîmê di 3'ê kanûnê de greva birçîbûnê hatibû destpêkirin û hê jî didome. Di dema çalakiyê de li ser armanca grevê belavok jî tên belavkirin. Têkildarî grevê çalakgeran diyar kir ku heta bidawîbûna tecrîdê û azadiya Ocalan dê çalakiyên xwe bidomînin.

Li paytexta Awûstûrya Viyanayê Komeleya Kurdî bi armanca şermezarkirina tecrîdê û bêdengiya navneteweyî, konê greva birçîbûnê veda. Bi dehan kurdistanî û dostên wan tev li çalakiyê bûn. Li gorî komîteya amadekar dê alakiya greva birçîbûnê 20 rojan dewam bike.

Her wiha tecrîda li ser Ocalan li bajarê Torîno yê Îtalyayê jî hat şermezarkirin.

**Tevlêbûn zêde dibe**

Her wiha bi heman armancê di 5'ê kanûnê de Kongreya Star û PYD'ê li bajarê Qamişloyê bi dirûşama 'Em ê faşîzmê bi hev re hilweşînin û bi Rêber Ocalan re azad bijîn' dest bi çalakiya greva birçîbûnê kiribû. Tevlêbûna çalakiyê her diçe zêde dibe. Di çalakiyê de hat gotin ku heta azadiya Ocalan dê çalakiyên wan bi awayekî cur bi cur bidome. ***AMED***



## 'Rewşa li Îmraliyê ji tecrîdê wêdetir e'

Li gelek bajaran parlamenterên HDP'ê ji bo 3 rojan çalakiya grevê pêk anîn û piştgirî dan çalakiya Leyla Guven. Li Amedê jî piştî çalakiya 3 rojan bi tevlêbûna nûneren KCD, HDP, DBP û Tevgera Jinên Azad (TJA), Meclisa Dayikên Aştiyê, Komeleya Xizmên Girtiyan (TUAY-DER) li avahiya HDP'ê ya civîna çapemeniyê pêk hat.

Di civînê de hevserokê KCD'ê Berdan Ozturk axivî. Ozturk anî ziman ku ev qêrîn û raperîn banga berpirsyariyê û pêkanîna hiqûqê ye û da zanîn ku ji sala 2015'an heta niha Ocalan di bin tecrîda giran de ye û wiha got: "Ev rewş ji tecrîda mutleq wêdetir e. Pergala Îmraliyê pergala NATO'yê ye, li wir qaîdeyên gladyoyê di meriyetê de ne."

**Bang li hêzên demokratîk hat kirin**

Her wiha Ozturk xwest tecrîd bi lez bê rakirin û ev tişt vegot: "Ji bo ku bi awayekî demildest tecrîda li ser birêz Ocalan bê rakirin, parlamentera HDPê ya Colemêrgê Leyla Guven 30 roj in di greva birçîbûnê de ye. Greva birçîbûnê ya ku bi daxwaza rakirina tecrîdê hatiye destpêkirin, bi beşdariya gelek girtiyên li girtîgehên Tirkiyeyê û bi endamên HDP, DBP, KCD û TJA'yê û bi parlemanteran berdewam dike. Ev qêrîn û raperîn dê gur bibe û pêkan e ku bigihîje asteke xeternak û bandorê li her kesî bike. Greva birçîbûnê hê negihîştiye asta xeternak û lewra ev yek fersendeke mezin e ji bo çareseriyê. Ji bo vê em bang li hemû hêzên demokratîk û aştîxwaz dikin ku li dijî vê tecrîdê derkevin." ***AMED***



## Ev raman bûye ya gel û civakê

**Rohat ARARAT / MÊRDÎN**

Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ji 27'ê tîrmeha 2011'an ve ye bi parêzerên xwe re, ji 5'ê nîsana 2015'an bi heyetan re û ji 11'ê îlona 2016'an ve ye jî bi malbata xwe re nikare tu hevdîtinê bike û di bin tecrîdeke giran de ye. Ji bo rakirina tecrîdê bi taybetî parêzerên Ocalan û siyaseta kurd serî li gelek saziyên eleqedar dan lê tu encam nehat bidestxistin. Herî dawî jî hevseroka KCD'ê û parlamentera Colemêrgê Leyla Guven ji bo rakirina tecrîdê dest bi çalakiya greva birçîbûnê kir. Piştgiriya ji bo çalakiya Guven û rakirina tecrîdê her ku diçe belav dibe. Li gelek bajaran parlamenterên HDP'ê jî di nav de çalakî tên lidarxistin û li hemû girtîgehên li Tirkiye û Kurdistanê jî girtiyên ji doza PKK û PAJK'ê ji 27'ê mijdarê ve bi awayekî bêdem û dorveger di çalakiya greva birçîbûnê de ne. Li avahiya HDP'a Mêrdînê jî parlamenterên bajêr Tuma Çelîk û Ebru Gunay ji bo 3 rojan ketin greva birçîbûnê. Parlalmenter Tuma Çelîk der barê çalakiyên grevên birçîbûnê ên ji bo rakirina tecrîdê nirxand.

Çelîk destnîşan kir ku beriya her tiştî hevala wan Leyla Guven mafdar e û lazim e tecrîd rabe. Çelîk da zanîn ku bi awayekî dixwazin gelê kurd jî tasfiye bikin lê astengiya li pêşiya yekpereziyê kurd û Tevgera Azadiya Kurd e û wiha got: "Ji ber vê yekê jî bi her awayî êrîş dikin û tecrîdê jî ez wekî parçeyekê vê pêk tînin."

**'Nikarin ramana me biguherînin'**

Di berdewamiya axaftina xwe de Çelîk ev tişt anî ziman: "Em bi çalakiya xwe dixwazin vî tiştî vebêjin; hûn çiqasî bi hêz bin, hûn çiqasî rêbazên antîdemokratî bi kar bînin, çi dixwazin bikin hûn nikarin ew fikra ku em jê bawer in hûn ji holê rakin. Hêza we jî têra vê nake. Hûn dikarin me biavêjin zindanan û destkeftiyên me ji destên me bigirin lê nikarin ramanên me biguherînin. Ev raman bûye ya gel û civakê. Veguheriye paradîgmayekê û sînorê Tirkiyeyê jî derbas kiriye. Em jî vê yekê nîşanî wan didin. Desthilatdariya AKP û MHP'ê dixwaze me bêdeng bike lê em jî bi danîna holê ya vîna xwe dibêjin ev ne pêkan e."

**Dê berxwedan berfirehtir bibe**

Çelîk destnîşan kir ku desthilatdarî ji bo pêşîgirtina çalakiyê û belavbûna wê çi ji destê wî tê dike û wiha bi dawî kir: "Êrîşa wan li avahiya me ya Mêrsînê jî ji ber vê sedemê ye. Yanî ji bo astengkirina belavbûna vê berxwedanê ye. Lê belê ne pêkan e ku dikaribin pêşiya vê yekê bigirin. Çawa ku êrîşî Mêrsînê kirin di heman demê de me li 25 navendan û meclisê çalakî geştir kir. Heke bi vî rengî tev bigerin jî dê ev berxwedan berfirehtir bibe. Ji xwe armanca me jî ew e ku em vê çalakiya hevala xwe Leyla li her deverê belav bikin."

## 'Divê Ocalan demildest bê azadkirin'

Parlamenterên HDP'ê Ayşe Acar Başaran û Mehmet Ruştu Tiryakî yên Êlihê ku 3 roj berê ketibûn greva birçîbûnê bi civîna çapemeniyê dawî li çalakiya xwe anîn. Di civînê de endam û rêveberên HDP'ê, Tevgera Jina Azad (TJA) û Partiya Herêmên Demokratik (DBP) amade bûn.

Di civînê de parlamenter Ayşe Acar Başaran axivî û anî ziman ku 3 roj in bi armanca daxwazên xwe bînin ziman û balê bikişînin ser tecridkirina Ocalan ketibûn grevê û wiha got: "Em li vir careke din bang li îktîdarê dikin. Bi lez Îmraliyê betal bikin û demek beriya demekê birêz Ocalan azad bikin. Îro em wekîlên HDP'î dawî li vê çalakiyê tînin lê dê çalakiyên me bi rêbazên cuda bidomin."

Her wiha çalakiya parlamenterên HDP'ê yên Stenbolê Huda Kaya, Dilşat Canbaz, Saruhan Oluç û Alî Kenanoglu jî bi heman armacî li avahiya HDP'ê ya Stenbolê ketibûn greva birçîbûn jî bi dawî bû. Dema bidawîbûna çalakiyê de berdevkê HDP'ê Saruhan Oluç axivî û ev tişt vegot: "Divê Leyla Guven demildest bê berdan. Pêwîst e tecrîda girankirî û li dijî mirovahiyê ya li ser birêz Abdullah Ocalan bi lezgînî bê bidawîkirin." ***ÊLIH - STENBOL***



**ŞÎROVE**

Ahmet AKTAŞ
saktas25@hotmail.com

## Astana jî têk çû

Li hemberî Cenevreyê, weke alternatîf Astana, Soçî hat sazkirin. Ev civîn projeyên her du dewletên sereke bûn. Projeya DYA'yê di bin sîwana sazûmana Neteweya Yekbûyî (NY) de li Cenevreyê komek rêze civîn pêkanîn. Hema bi lez û bez Rûsyayê jî projeya xwe ya alternatîf li Astana û Soçiyê xist rojevê.

Ji ber ku di her du projeyan de, ne gelê me û ne jî berjewendiyên gelên Sûriyeyê û yên herêmê dihatin parastin û diket rojevê, lewma li pêşiyê ya Cenevreyê, niha jî ya Astana û Soçiyê têk diçê.

Di her du projeyan de, Rûsya û Amerîka, komên ku wan ava kiribûn an jî yên di bin fermana wan de kar dikirin, beşdarî civînên xwe dikirin. Lewma nikaribûn xwe bi raya giştî bidana pejirandin û rût û pût bê wate man li ortê.

Xwedêgiravî, di vê civîna dawiyê ya Astanayê de ew ê makezagona Sûriye ya dahatûyê amade bikirana û pêşkêşî raya giştî bikirana. Lê hîn di serî de beravêtî dest bi civînê kirin. Ji ber ku Tirkiye, navên ku Rûsya û Îranê xwestibû beşdarî civînê bikin, red kiribû.

Li ser van nakokiyan, nûnerê karê Sûriyeyê yê DYA'yê James Jeffrey got "berê me jî piştgriya vê civînê dikir, lê êdî tu wateya vê civîna Astanayê nemaye, lazim e fîşê wê were kişandin"!

Li ser vê helwesta Jeffrey, Çavuşoglu gelek hêrs bû û bertekeke tal dayê. Jixwe weke tê zanîn li ser kuştina Cemal Kaşikçi navbera wan û DYA'yê de gelek nexweş bûye û diyar e, ger weke para xwe, hinek pere ji vê bûyera qirêj bi dest nexin, bi zimanekî şantajê dibêjin "em ê vê dozê bibin dadgeha navdewletî".

Navbera DYA û Îranê çendî xerab e, tê zanîn. Her wiha li ser Sûriyeyê navbera Tirkiye û Îranê jî xerab e. Lewma dibe ku Rûsya û Amerîka li ser Suriyeyê, bêyî Tirkiyeyê di hinek mijaran de li hev kiribin.

Ew lihevhatina Rûsya-Îran-Tirkiyeyê ji bo Idlibê ya li Soçî nemeşiya û wisa tê xuyakirin ku dê nemeşe jî. Li gorî peymana wan, diviya di 15'ê cotmehê de ew şertên dabûn ber Tirkiyeyê pêk bihatana. Lê pêk nehatin, şer û pevçûn û aloziyên herêma Idlibê li ber çavan e. Ev jî nakokiyên navbera van dewletên hevalbend dijwar dike.

R. Erdogan fortan dike û gefan dixwe ji bo êrîşên xwe berfireh bike û bi vî awayî, dixwaze ser eybên xwe binixumîne, veşêre. Lê hewldan û şantajên wî êdî nema bi kêr tên, ji ber ku êdî her tişt aşkera ye.

Erê çû Venezuela û serokê wir Maduroyê mexdûrê Amerîkayê, gelek pesindariya wî kir û bi vî awayî navê şoreşgeriyê jî careke din lewitand. Wî jî wek selefê xwe pêşwazî kir; berî mirina xwe pesindarî û hevalbendiyeke mezin ji Îranê re dikir. Xwedêgiravî "dijberê Amerîkayê ye". Ê baş e ma Recep dijberê Amerikayê ye, an jî yê ew anî ser hikûmdariya Amerîkayê bi xwe ye? Ma tu ewqas reben û nezan î Maduro, ya jî tu raya giştî nezan dibînî!

Lê ev jî nikare Recep ji wê qirêjî û xwînxwariya wî paqij bike. Ev çawa di dîndariyê de sextekar e, Maduro û selefên wî jî ewqas di şoreşgeriyê de cahil û nezan in. Bi tenê dikarin hevdu bilewitînin, nikarin hevdu rizgar bikin. Demekê ew û Macron jî bûbûn dostên hev. Lê wa "Êlek Zer"an ew xistiye çi halî. Xwedê dizane aqûbeta wî jî ne bi xêr e.

Hey Recep, ji xwe "Êlek kesk û sor û zer" ên kurd, li ber eniya te hene, lê ne dûr e ku weke Geziyê "Êlek Zer"ên mîna Fransayê jî li te rabin. Heta ne xerîb e ku ew hevalbendên te yên rîh tefşo û şaşik reş û mejî reşên DAIŞ û El Nusrayê jî li xwediyê xwe li te werin xezebê. De li hev bimbarek bin! Balafira dosta te jî li hewa xera bû, li welatekî wek Almanyayê hosta nedîtin ku temîr bikin. Ka balafira te wê kengê li ku xera bibe!



## Li Îranê teqîn: 4 kuştî û 15 birîndar

**TEHRAN -** Li bajarê Çabahar ê ser bi parêzgeha Belûcistana Îranê ku dikeve başûrê rojhilat, li nêzî navenda polîsan wesayîteke bombebarkirî teqiya. Li gorî daxuyaniya qeymeqamê Çanbaharê, di teqînê de 4 kesan jiyana xwe ji dest daye û 15 kes jî birîndar bûne. Lê hinek çavkaniyên din jî hejmara kuştiyan 3 û ya birîndaran jî 19 didin. Li gorî ajansa İRNA'yê jî di nava kuştiyan de leşkerekî payebilind ê bi navê Heyder Alî Kîxanî jî heye.

# Li ser kabîneya nû li hev nekirin

Ji ber nakokiyên li ser namzetên wezaretan civîna li parlementoya Iraqê bê encam ma. Biryar hat dayîn ku parlamento bicive, lê di rojevê de diyarkirina kabîneya nû dê nîn be. Ev jî nîşan dide ku hîn jî li ser namzetên wezaretan lihevkirin pêk nehatiye



Roja sêşemê parlementoya Iraqê ji bo diyarkirina 8 wezaretên kabîneya Adil Ebdulmehdî yên mane diyar bikin, kom bû. Lê ji ber nakokiyên li ser namzetan û wezaretan alozî çêbû û parlementeran dest li hev rakêşan. Nakokiya sereke jî li ser wezareta navxweyî û wezareta parastinê bû.

Serokwezîrê Iraqê Adil Ebdulmehdî navê 8 namzetên ji bo 8 wezaretên ku hîn nehatine diyarkirin pêşkêşî parlementoyê kirin. Lê komên di parlementoyê de li ser hinek namzetan li hev nekirin. Bi taybetî nakokî li ser namzetên wezareta navxweyî û wezareta parastinê heye. Ebdulmehdî ji bo wezareta karên navxweyî ku para şiayan e, Falih Feyaz û ji bo wezareta parastinê ku para siniyan e jî Feysel Cerba nîşan da.

Roja sêşemê çend komên parlementoyê rûniştinê boykot kirin. Bi taybetî Hevpeymaniya Çaksazî ya bi serokatiya Hevpeymaniya Mûqteda Sedr û YNK'ê jî rûniştinê boykot kir, ji ber ku wezareta dadê ji bo wan ne hatiye dayîn.

Tê gotin ku di rûniştina roja sêşemê de hewl hatiye dayîn ku bi rêya hîleyan hejmara yasayî ya parlementoyê temam bikin û bi vî awayî namzetan di dengdanê re derbas bikin. Lê Hevpeymaniya Çaksaz vê hîleyê deşîfre kir ku gelek şêwirmend û kesên din yên derveyî parlementoyê anîbûn nava parlamentoyê. Ji ber vê jî li parlementoyê alozî çêbû. Parlamenterên koma Saîrûn û Fetih dest li hev rakêşan.

Hevpeymaniya Saîrûn ya Mûqteda Sedr ku koma herî mezin a parlamentoyê ye, ji namzetên wezareta navxweyî û wezareta parastinê nerazî ye û daxwaza namzetên serbixwe yên ji aliyan û hizban dûr, dike.

Saîrûn wer difikire ku Falih Feyaz ne namzetê Adil Ebdulmehdî ye û dibêjin, ev namzetê koma Fehid a Hadî Amirî ye. Her wiha dibêjin ku Îran li pişt Falih Feyaz e (wezîrê navxweyî). Dixwazin bi vî awayî li gel Siûdiyê hevsengiyekê çêbikin, ji bo vê jî dixwaze Feysel Cerba bikin wezîrê parastinê. Parlamenterên Saîrûnê bi hev re bang kirin ku ew namzetên iraqî (serbixwe) dixwazin.

Falih Feyaz berî niha serokê Desteya Heşdî Şebî bû. Lê, bi fermana serokwezîrê berê yê Iraqê Adil Ebdulmehdî, ji erka xwe hate dûrxistin. Piştî wê jî Feyaz peywendî li gel hevpeymaniya Fetih a Hadî Amirî saz kir, da ku wî bikin wezîrê karên navxweyî.

Saîrûn ne tenê daxwaza guhertina Feyaz e her wiha li dijî wê ye ku Feysel Cerba bibe wezîrê parastinê. Berdevkê Hevpemaniya Saîrûn, Casim Hilif, nêrîna hevpeymaniya xwe aşkera kir û got ku ew dixwazin wezareta ewlekarî û navxweyî dûrî hizban be û kesên jêhatî û hêjayî van wezaretan bin werin ser kar. *BEXDA*



## Gelo kî dê bikeve şûna Merkel?

Kongreya CDU'yê sibe li Hambûrgê dest pê dike. Di kongreyê de dê kes/a li şûna Merkel rûnê bê hilbijartin. Schaûble piştgiriyê dide Merz, Merkel jî piştgiriyê dide Kramp-Karrenbaûer.

Ji bo Partiya Demokratên Xiristiyan (CDU) ku yek ji partiyên bingehîn ên Almanyayê ye, ji sibe û pê ve serdemeke nû dest pê dike. Kongreya CDU wê 7-8'ê kanûnê li bajarê Hambûrgê pêk were. Angela Merkel ku 18 sal in seroka giştî ya CDU'yê ye, beriya niha dabû xuyakirin ku wê nebe namzeta serokatiyê.

Pêşbirka li ser lîdertiyê ya li nava CDU'yê, di navbera sê navan de derbas dibe; sekretera giştî ya CDU'yê Annegret Kramp Karrenbaûer, serokê berê yê Koma CDU'yê Friedrich Merz û Wezîrê Tenduristiyê Jens Spahn.

Nêzî hezar delege wê tev li kongreyê bibin û tê payîn ku hilbijartin were kirin. Namzeta Merkel Kramp Karrenbaûer ye. Lê belê karê Merkel zehmet xuya dibe. Ji ber ku yek kesayetên girîng ên li nava CDU'yê, serokê Meclisa Federal Wolfgang Schaeûble e ku di hevpeyvîneke xwe ya di çapemeniya alman de bi awayekî vekirî got ku ew dixwaze Merz bibe serokê partiyê.

28'ê cotmehê di hilbijartinên Eyaleta Hessenê de CDU'yê bi rêjeya ji sedî 12 dengan kêm kiribû. CDU û CSU'yê li Bayernê di hilbijaritnê de dengên xwe gelekî kêm kirin û li ser vê encamê Merkel dabû xuyakirin ku ew êdî nabe namzeta ji bo serokatiya giştî. *BERLÎN*

## Hikûmeta Macron paşve gav avêt

Li Fransayê di 17'ê mijdarê de bi tevlêbûna bi hezaran çalakvanan, li hemberî zema ku dê hikûmeta Macron li sotemeniyê bike, çalakî hatin lidarxistin. Çalakvanên ku weke 'Êlek Zer' tên naskirin, di hefteya 3'yemîn de jî çalakiya xwe berdewam dikin. Çalakiyên ku li hemberî zema benzînê derketin, roj bi roj mezin bûn û li gelek bajarên Fransayê belav bûn. Li ser mezinbûna çalakiyan re jî hikûmeta Macron paşve gav avêt.

Di roja sêşemê de serokwezîr Edouard Philippe da zanîn ku dê zem 6 mehan şûnde bikevin meriyetê û duh jî da zanîn ku zema ku dihat payîn dê ji bo sotemeniyê bê kirin, betal kirine. Hêjayî bibîrxistinê ye ku di çalakiyên ku ji bo protestokirina bihayê sotemeniyê de 4 kesan jiyana xwe ji dest da.Serokwezîr Philippe di axaftina xwe de anî ziman ku hikûmet ji diyalogê re vekirî ye û vê niyeta xwe jî bi derxistina zema sotemeniya ji butçeya sala 2019'an re nîşan dide. Bi vê re jî cara yekeme ku hikûmetê paşve gav avêt û da zanîn ku baca nû dê ji bo temamiya sala 2019'an dê bên sekinandin. Lê tevî vê Êlek Zeran ji bo roja şêmiyê banga çalakiyan kir. *PARÎS*



## Awûstûryayê kîsikên plastîk qedexe kirin

Piştî Fransa û Îtalyayê, Awûstûryayê jî biryar da ku kîsikên plastîk qedexe bike. Wezareta Tûrîzmê ya Awûstûryayê ku ji karên hawirdor, daristan, çandinî û tûrîzmê berpirsyar e, daxuyaniyek da û diyar kir ku kîsikên plastîk wê ji sala 2020'î pê ve bi temamî bên qedexekirin.



Wezîr Elîsabeth Kostînger got ku Awûstûrya wê piştî Fransa û Îtalyayê bibe welatê sêyemîn ku biryareke bi vî rengî ya berfireh wergirtiye. Li gorî biryara wezaretê, wê kîsikên hîn qewîn bên çêkirin, ji bo ku karibin gelek caran bên bikaranîn.

Li Awûstûryayê ku nifûsa wê 8,8 milyon e, tê gotin ku tenê li sektora xurekên salane 430 milyon kîsikên plastîk tên bikaranîn. Di encamê de salane bi 7 hezar tonî gelaşên plastîk derdikeve holê. Ev gelşên plastîk jî bi giranî ji ber kîsikên plastîk ên zirav ên ji bo zebze û fêkiyan tên bikaranîn, pêk tê. *VIYANA*



## Budçeya Tirkiyeyê hat kêmkirin

Yekîtiya Ewropayê (YE) di budçeya sala nû de, fona ku ji bo Tirkiyeyê veqetandibû kêm kir. Li gorî budçeya nû ya Ewropayê 1.45 milyar euro ji bo penaberên Sûriyê yên li Tirkiyeyê hatiye veqetandin. Ji ber ku gotûbêjên endamtiya YE'yê bi Tirkiyeyê re hatine rawestandin budçe jî ji bo mijarên cuda ji Tirkiyê re nehatiye dayîn.

Tê payîn ku Tirkiye bi caran li ser penaberên Sûriyeyê bi YE'yê re hevdîtin kir û daxwaza ku budçeya ku didinê kêm e. Tirkiye gelek caran bi penaberan jantaj kir û li hemberî dewletan bi kar anî lê belê ev jî aliyê welatên din ve nehat qabûlkirin.

Budçeya sala nû ya YE'yê wek 148 milyar euro hatiye hesabkirin.YE'yê pereyên ku heta niha dida Tirkiyê jî bi qasî 146,7 milyon euroyî kêm kir. *BRUKSEL*

ÇAMA CÎHAN
Ramazan OLÇEN
ramazanolcen@hotmail.com



## Êlek Zer ne tenê Êlek Zer in

Li Fransayê ji 17'yê mijdarê ve çalakiya Êlek Zeran dewam dike. Heta di hin weşanên çapemeniyê de hat diyarkirin ku hikûmeta Manu (Macron) li dijî çalakiyan qebûl kiriye, bihayê sotmeniyê 6 mehan zêde neke. Lê Êlek Zer bi ewqasî razî nabin û ew jî ji eniya xwe ve dibêjin; em hûrikên nan naxwazin em nan dixwazin.

Helbet ji roja ku ev çalakî dest pê kirin ve çapemeniya liberal jî û çapemeniya di bin hawêra pergalê de ye, îdia dike ku çalakî ji aliyê faşîstan ve tê birêvebirin. Heta hin kesayetên çepgir jî berbayê van îdiayan ketine û ew jî heman tiştî dibêjin. Wisa xuya ye ku wê ev mijar û xwepêşandan hêj demeke dirêj dewam bikin.

Li dijî kesên ku îdia dikin li pişt van çalakiyan navtêdana rastgirên tundrew Le Pen heye jî ev yek ne rast e. Aliyê xwe yê rast ew e ku yên alîgirên Le Pen û siyaseta wê ne jî di nav çalakgeran de hene ku vê yekê înkar nakin. Lê heke em bi tenê bi vî çavî li meseleyê binihêrin, em ê jî bikevin hawêra propagandayên Manu û dewleta Fransayê.

Çalakî bi awayekî jixweber dest pê kirin. Ji herêmên ku ji paytexta Fransayê dûr in li wan navçe û bajarên gund û gundewar dest pê kirin. Cihên navborî ew herêm in ku ji siyaseta rastgir re dengên herî zêde derdikevin. Lê li aliyê din çalakger ji bo ku dengê xwe bidin bihîstin li nav dilê Fransayê li Parîsê û li kolana ku sembola dewlemendiyê ye ango Champs-Élysée ev xwepêşandan pêk hatin û li seranserî Fransayê jî belav bûn.

Di bingeha van çalakiyan de heke mirov bi du gotinan bibêje; dijberiya 'dewlemendî' û 'newekvehî'yê heye. Polîtîkayên Manu û nemaze jî bihakirina sotemeniyê (benzîn û mazot) bû weke dilopa dawîn. Manu beriya bihakirina sotemeniyê baca dewlemendiyê rakiribû ku ev yek di esasê xwe de têra xwe ji bo raperîneke bi vî awayî bes bû. Hinekên ku dibêjin li pey van xwepêşandanan rastgir hene, bi raya min heke li manîfstoya wan a 42 salî binihêrin wê fêm bikin ku mesele çi ye.

Dîsa li aliyê din ev manîfesto jî dîsa ji aliyê çalakgeran ve bi anketa ku bi 30 hezar xwepêşanderî re hatiye kirin derketiye holê. Li holê wakiayeke ku di warê civaknasiyê de jî li sere nîqaş bên kirin û were analîzkirin heye. Helbet ji bo fêmkirina Êlek Zeran belkî mirov dîsa xwendineke der barê 'Bihara Erebî' de jî bike wê baş be. Çalakiyên li Tunus û yên vê dawiyê yên li Îranê jî hêja ne ku mirov wan bi bîr bîne û bi wî çavî li meseleya Êlek Zeran binihêre.

Hikûmeta fransî û serokomarê Komara 5'emîn Macron fêhm kiriye bê ka ev çalakî peyameke çawa didin. Jixwe ji ber wê ketiye tatêla parastina pergalê. Macron dibêje ku ev çalakî pergalê hedef digirin. Li gorî min jî ya rast e ev. Êlek Zer dixwazin hatinî bi adilane were parvekirin. Ev daxwazeke lumpen jî nîn e.

Çineke din derdikeve holê û daxwaza wê zelal e. Bes di warê pêşengiyê de hin problemên wê hene. Lê ji manîfestoya wan jî diyar e ku ew dikarin ji nava xwe jî pêşengên xwe derxînin. Ne bi argumantên rastgiriyê ne jî bi argumantên çepgiriya klasîk ev çalakî nayên fêhmkirin. Dîtin û nêzîkatiyeke nû lazim e.



## Vîşêrê Rayîrberîya Xoser kesêk hetkarî nêda

**ŞEHBA -** Hemwelatîyê Efrînî dîyar kerdî ke badê ke ê Efrîn ra derbazê kantonê Şehba bîyî ti rêxistinêk hetkarî nêdayo înan. Sewbîna dayî zanayene ke Rayrîberîya Xoserîya Demokratîke ya Herêma Efrînî bi îmkananê xo kêman hetkarî daya înan. Ameyîşê zimistanî reyde mazot û sobe ameyî vilakerdiş. Derheqê babete de endama Meclisê Kantonê Efrînê Xatûn Ehmed, dayîka Medîne Mihemed û Hêvîn Birîme dîyar kerdî ke ti rêxistinê mîyandewletî hetkarîya înan nêkerdî.



# Mesele bi hepskerdiş çareser nêbeno

Paştîdayîşê grevê Leyla Guvene zêde bena. Şarê Colemêrgî paştî dano Guvena ke zîndan de seba wedartişê tecrîdê serê Ocalanî grevê vêşanîye de ya. Hemwelatijan vatî: "Waştişê Guvene waştişê ma pêrunan o. Ganî tecrîdê serê Rayberê ma bêro wedartene."



Nizdîyê 2 serrî yo ke Girawa Îmrali ra ti xebere nîna girewtiş û na rewşe ver etirîyayîşê şarî her ke şono giranêr beno. Hemsereka Kongreya Komela Demokratîke (KCD) û parlamentera Partîya Demokratîke ya Şaran (HDP) ya Colemêrgî Leyla Guvene seba wedarnayîşê tecrîdê serê Rayberê Şarê Kurdî Abdullah Ocalanî 8ê teşrîna peyêne de grevê vêşanîye daye dest pêkerdiş û çalakîya Guvene dewam kena.

Hemwelatijanê Colemêrgî yê ke qisey kerdî, ardî ziwan ke Guvene parlamenter û îradeyê înan a û ê kîşta aye de yê. Derheqê babete de hemwelatîyê bi nameyê Fatma Turane, Necmetîn Acarî û Îsmaîl Keskînî qisey kerdî û dîyar kerdî ke ê piştî danî grevê Leyla Guvene.

**Ganî tecrîd bêro wedartene**

Hemwelatijan ra Fatma Turane vist vîrî ke Guvene bîlaheq zîndan de yena tepiştene û va: "Ma çalakîya Guvene rê wayîr vejîyenî. Weçînayîşî ser a 6 mengî ravêrtî ma hema parlamentera xo nêdîya. Ma wazenê ke parlamentera ma cayê ma de bo. Waştişê Guvene waştişê ma pêrunan o. Ma seba weşîya Birêz Ocalanî qisewet kenî. Ganî tecrîdê serê Rayberê ma bêro wedartene."

**Hepskerdişê kurdan çare nîyo**

Necmetîn Acarî zî çalakîyê paştîdayîşê Guvene ardî vîrî û va: "Ganî tecrîdê serê Birêz Ocalanî cade bêro wedartene û meseleyê kurdan bi aşîtî bêro halkerdene. No mesele bi hepskerdişê kurdan çareser nêbeno. Şarê kurdî do tim bi xoverdayîşî cewab bido."

**Ganî her kes wirzo lingan ser**

Îsmaîl Keskînî zî Ocalan sey îradeyê bi mîlyonan name kerd û wina domna: "No tecrîdo ke serê Birêz Ocalanî de yeno domnayene, ma esla qebûl nêkenî û çalakîya parlamentera xo Leyla Guvene silam kenî. Waştişê Guvene waştişê ma yo. Ganî heme merdimîye seba wedarnayîşê tecrîdî wirzo lingan ser. Tecrîd sucê merdimîye yo. Coka çalakîya Guvene zaf bierj a." ***COLEMÊRG***

## Şaredarîya CHPyî îxracan tesdîq kena



Mamoste Ebru Dînçere arde ziwan ke hemşaredarîyê Bajarê Gird ya Îzmîrî nizdîbîyayîşêke îqtîdarî ramojnenê. Dînçere daye zanayene ke Îzmîr de nêzdîyê 200 kedkarî girêdayê KESKî û xeylê kedkarê ke ameyî îdîakerdiş endamê FETO nêameyî îxrackerdiş û senîn îxrac ameyî kerdene şaredarîya Bajarê Girdî ya Îzmîrî ewil qertî (KentKart) betal kerdî.

Dînçere qiseykerdişê xo de wina va: "Xeylê kesê ke ameyî îxrackerdiş seba krîzê ekonomî domanê xo sazgehê perwerdeyî girewtî. Merkezê CHP yê ciwanan tena xizmet dano ciwanê CHPyî. Ganî seba doman û ciwanan qadê cuyayîşî bêrê akerdene. Ganî xizmetêke têduşt bêro dayene. Ganî seba cinîyan stargeh bêrê akerdiş. Şaredarîya CHPyî îxracan tesdîq kena." ***ÎZMÎR***

## Mehkema nêeşka sucek peyda bikera




21ê êlula 2015î de bi mehneya parlementerên HDPyî yê verên Leyla Bîrlîk, Ferhat Encu û Mehmet Alî Aslanî serê rayîrê Şirnex-Qilebanî de dewa Dagkonakî ra noqtaya leşkerî derbaz kerdî û serkêşîya çalakîya 'mertalê ganî' kerdî, hetê Dozgerîya Komarî ya Şirnexî ra derheqê înan de tehqîqat ameybî dest pêkerdene. Her çiqas ke parlementerî bi destûrê leşkerî nuqtaya leşkeran derbaz bikerî zî, reyna bi mehneya 'şîyayîşê herêma qedexe ya leşkerî' derheqê înan de îdîaname ame akerdene û îdîaname de ame waştiş ke mabenê 2-5 serran de ceza bidîyo parlementeran. Îdîaname 14ê nîsana 2017î de hetê Mehkemaya Cezaya Aslî ya Şirnexî ra ame qebulkerdene.

Badê 6 roniştişî Mehkemaya Cezaya Aslî ya Şirnexî bi mehneya suc bedilîyayo, dosya erşawite 2. Mehkemaya Cezaya Giran ya Şirnexî. Avûkatê parlementeran Şivan Cemîl Ozenî îtiraz kerd, labelê 1. Mehkemaya Cezaya Giran ya Şirnexî îtirazê Ozenî red kerde. 2. Mehkemaya Cezaya Giran ya Şirnexî zî dosya erşawit Mehkemaya Îstinafî ya Dîlokî. ***AMED***

## Polîsan pawenî û delîlan nimnenî

31ê kanûna 2017î de bajarê Dîlokî de polîso binameyê Hasan Bîlgîyî bi îdîaya goş nêdayo îqazê 'vindetişî' gule reşêna wendekarê lîse Ekrem Gorkem Karakano 16 serrî ser û bi giranî ame birîndarkerdene. Gorkemî badê dermankerdişê 14 rojan nêweşxane de cuya xo vindî kerd. Hedîse ra dima doze ame akerdene, labelê heta nika doze de ti gamêk nêameyo eştene. Ewro 3. roniştişê doze do bêro dîyayene. Avûkatê Gorkemî, Bulent Duranî bale ant dosya ser û ard ziwan ke dosya de ti gamêk nêameyo eştene.

Duranî qiseykerdişê xo de wina va: "Cayê qewimîyayîşê hedîse de xeylê kamera estî, labelê polîsî zabitname de 'Cayê hedîse de kamera çin o' nuştî. Dozger nuşteyê 17ê çeleyî de dayo zanayene ke kamera estî, labelê xirabe û qeydê hedîse çin î. Hewl dîyeno ke delîlan binimnî û sey qezaya trafîkî bidî nîşandayene. Heyetê mehkema polîsan paweno. Heta ke doze bêra roşnakerde, ma do fek taqîpkerdişî ra vera nêdî." ***DÎLOK***



## Seba pakîya bajar xebetîyenî

Hemsereka Beşê Ekolojî ya Şaredarîya Şar ya Bajarê Til Temirî ya Kantona Hesekê Hemdiya Hisêne daye zanayene ke pakîye wayîrvejîyayîşê weşîya merdiman a û wina domnaye: "Bajarê Til Temirî de karkerê pakîye her roje verîyenê raşteyan û bajar pake kenî. Ganî şar zîpiştî bido ma. Ma wazenê kulturê pakîye mezgê merdiman de bidî bi ca kerdiş.

Hemdiyaye dewamê qiseykerdişê xo de wina va: "Ma wazenê kulturê Netewê-Demokratîke mîyanê şarî de vila bikerî. Kulturê Netewê-Demokratîke her hetê cuye ra berpirsîyar o û mirdê heme kesan keno. Wezîfeyê heme kesan o ke seba weşî xizmet bikero. Bi pakîye xozaya bajar yena pawitiş û merdim nêweş nêkeweno. Ma mecburê ke kesê ke hetê pakîye de baldar nîyî ro ceza bibirnî." ***HESEKÊ***

## Berpirsîyarê şewatê kursê Qur'anî miftî yo


Dewa Karaagaçî ya qezaya Pasûrî ya Amedî de 1ê kanûna 2015î de saetê şewe de adir kewte Kursê Qur'anî ke girêdayeyê Miftîtîya Qezaye bî û şewat de domanê bi nameyê Nur Muhammed Bayka, Mehmet Bîngol, Suat Çankaya, Serhat Sancar, Şahîn Kahraman û Sabahattîn Altunî meridbî.

Doza ke derheqê hedîse de ameybî akerdene de ame waştiş ke mabenê 3-18 serran de ceza bîdîyo musnoxê kursî Faruk Işik û keyayê dewe Ozcan Ceylanî rê.

Sewbîna 6. Mehkemaya Cezaya Giran ya Amedî waşt ke 'seba ke bîyî sebebê merg û birîndarîya xeylê kesan' Heyetê Keyatî yçê Dewe Abdullah Cengîz, Hanîfî Dîzmen, Hiyasettîn Bartar û Sebahattîn Çankaya mebenê 2-15 serran de bêrî cezakerdene. Miftîtîya Pasûrî derheqê awanîya ke teberê qanûnê îmarî ameyo viraştene, tesîsatê cereyano qaçax awanî de esto û saetê cereyanî çin o de muracatê Serektîya Karê Dîyanetî kerdbî. Labelê derheqê îdarekarê Dîyanetî û sewbîna berpirsîyaran de ti dozêk nêame akerdene. Derheqê hedîse de rapor ame amadekerdene û goreyê raporî musnox Faruk Işik qusurdaro yewinî fîrma û heyetê extîyaran ke tesîsatê cereyanî dayî viraştiş zî diyîn î û Miftîtîya Qeza zî bê qusur a. ***AMED***

## SERADA VÎRÎ

Nesrîn NAVDAR
NesriNavdar@hotmail.com



### Serkewtişê ma yewîtîya ma de ya

Wexta merdim anêno peyman û hiqûqanê dewletanê Ewropa ra ke bi mexsedê Heqanê Bingehînan ê Merdimahî yê gerdûnî ameyê viraştişî û qebûlkerdişî merdim vano qey bi raştî nê peyman û hiqûqî semedê heme merdimahî yenê bi ca ardişî la, raştî qet sey ke eyseno nîya.

Tenê merdim banîro binlingkerdişê heqanê merdimahî ke hetê dewlete Tirkîye ra nê serranê peyînan de şarê Kurdî ser de pêk ardê ra û hemverê nê kerdişanê înan bêvengîya dewletanê ke wayîrê peymananê heqanê merdiman ê (!) ra zî merdim baş fam keno ke samîmîyetê înan ê nê peymanê newînan ra çi derece de yo. Hemvero ke verepersîya dewleta Tirkîye zî di nê peymanan de esta zî heta nika ti hesabêke aye ra nêameyo perskerdişî heta hetê zehfê dewletan ra paştî aye rê amîya dayîşî.

Nê serrê peyînan de bi desan şaristan û qezayê Kurdan hetê na dewleta ke îmzaye aye zî binê ay peymananê (qaşo) heqanê merdimahî de esta ra ameyî xerakerdişî, bi seyan tûtî, cinî û extîyarî ameyî kiştişî, bi hezaran merdimî ameyî koçkerdişî, cinî û tûtan ra bigî heta siyasetmedar, polîtîkakar û rayveberê xocayî yê Kurdan ke îradeyê şarê Kurdî yê ameyî hepiskerdişî, heta raybazêke hovane (sey xerakerdişê goran) ke heta nika hetê ti dîktatoran ra nêameyo kerdişî zî hetê na pergale ra şarê Kurdî ser de pêk ame û ancî heme dewletî bê veng mendî.

Ma bî şahid ke dewletanê Ewropa û dewletê bînî ke vanê ma wayîrê demokrasî û heqanê merdimahî yê gerdûnî yê bi kaykerdişê xo yê hîrê meymûnan hetkarî da kerdişanê na pergala faşîst e.


Yanê merdim eşkeno vaco ke peymanê ke semedê heqanê merdimahî viraştê qet semedê merdimê ke binê desthilatîyanê netewdewletan de tûşê neheqî, tehda û zilmî yenê nêfînenê dewre û heta zehfê rayan hetkarîya pergalê newînan kenê.


Yanê bi vatişêke bîn; nê peymanê înan peymanê heqê merdiman nîyê peymanê hetkarîya netewdewletan ê. Ma vînenê, hemvero ke îmzaye dewlete Tirkîye binê zehf peymananê heq û hiqûqê merdiman a gerdûnî de esta zî bi awayêke xo ra bawer ke go ti dewletêke aye ra binlingkerişanê aye ke heqanê merdimahî yê şarê Kurdî ser de û bêhiqûqî û tehdayanê ke înan ser de pêk ana nêwazo.

Xo ra yeno zanayîşî di kompolya ke Rayberê şarê Kurdî ser de pêk amî de zî destê zehfê netewdewletanê dinya esto û eyro zî destekê înan tecrîd, bêhiqûqî û hovîya ke ey ser de pêk yena de esto.

Ancî dagirkerdişê aye yê Efrînî û hewldayîşê aye yê Rojawanî zî bi destekê eynî dewletan domêno. Helbet sere de cinîyê Kurdan heme şarê Kurdî risayê na hişmendî ke bi vatiş û peymananê netewdewletan nêxapêyê û bi têkoşîn û yewîtîya xo biarsê heqanê xo yê bingehînan ê merdimahî û azadîya xo. Nê têkoşînan ra yew zî hetê siyasetmedara Kurd e Leyla GUVENe ra ke semedê wedartişê tecrîdê Rayberê şarê Kurdî ser de aşmêke yo bi grevê veyşanî dayo destpêkerdişî yo.

Giroteyanê azadî, siyasetmedaran û şarê Kurdî yê bînan zî verepers da nê waştişê têkoşera rêzdar e û dest bi grevê veyşanî kerd. Her çiqas netewdewletî goreyê nehfanê xo ra û elehîya ma de tê bigeyrê zî ma zanê ke serkewtişê ma zî, azadîya ma zî di yewîtîya ma de ya.





Kakşar OREMAR

# Birîna reş, êşên bêdawî!

“Zanyar hingî nûciwan bû. Liv û lebata wî ji jiyanê re weke barana destpêka biharê bû. Piştî wê roja herî nexweş êdî zimanê wî û gelek zarokên din ji kar ket…”

Beriya ku ji hundirê odeya rûniştinê derkeve, li milê rastê yê dîwar nihêrî. Li ser dîwarê malê wêneyekî kevin û di tozê de werbûyî ê şoreşgerekî navdar hebû. Wêne yê Ernesto *“ Che”* Guevara ( 1928-1967 ) bû. Li jêr wêneyê Che gotineke wî ya balkêş bi zimanê farisî hatibû nivîsîn. Pêşmergeyekî Komelê di salên destpêka şoreşa gelên Îranê de ew wêne bi dîwarê malê ve zeliqandibû û êdî wiha mabû. Hingî zarok sava bûn û yên mezin jî nexwende. Che kî ye an çi kiriye, jê bêxeber bûn. Êdî wêne mabû li cihê xwe lê ji endamên malbatê pê ve zêde nedikete berçavan an jî wisa ketibû bin domana salên temenê xwe ku reng û rûyê wî jî baş nedihate ber çavan. Keça ciwan a malê Neşmîlê li wêne nihêrî û belkî ji bo cara hezarê bû ku dîsa ew gotina Che xwend: ***“Ger mirov di jiyanê de ji xeynî hêviyê hemû tiştan ji dest bide asayî ye, çimkî hêvî rêya yekê ye ji bo bidestxistina hemû tiştekê.”***

Bi dijwarî hilm dikişand, mistel li singê xwe da, rûnişt û dîsa li wênê nihêrî: ***“Ev gotin ya hingî ku bombeyên kîmyewî tunebûn. Hêza hilmkişandinê ku bi te re nemîne, êdî hêvî çawa bimînin…”.*** Wiha got û ji bo nûkirina hilma singa xwe derket derve.

Dayîka wê ***“Daye Zerî”*** li ber deriyê malê teşî dirist û pezê wê li dorê diçerî. Jineke ku hînî dersên jiyanê bûbû û di nava gundiyan de weke “serejin” dihate naskirin. Li Neşmîlê dinihêre û êdî disekine.

Werin em herin herêma gundekî girêdayî bajarê Dalaho ( Kerend ) yê girêdayî wilayeta Kirmaşanê. Rojek ji rojên havîna sala 1988’an li gundê Zerde yê girêdayî herêma Banzerde dîrokê şahidî ji rûdaneke tije êş û xem kirk û hê jî ji bîra mirovahiyê neçûye.

**Şerê Îran û Îraqê**

Ji 1980’yî heta 1988’an şerekî dijwar di navbera du dewletên Îran û Îraqê de çêbû lê dîsa giraniya şer li ser singê axa Kurdistanê bû. Pê re jî rewş berdewam bû. Rojekê bombe û mayîn, rojekê kûlber û kuştin, roja din îdam û zindan;  Sine, Maku, Sedeşt, Urmiye, Îlam, Soran, Qeladizê, Raniye, Qesrî Şirîn, Kirmaşan, hemû rojhilat û başûrê Kurdistanê bûn hêlînên vehewandina mirin û tinekirina nîşanên jiyanê. Xem û kovan ketine pey hev û xelas nabin. Ji hêlekê rewşa hewayê, ji hêla din şer, binpêkirina mafan bi awayekî bêsinor di gelek waran de reng û rûyê xwe didin xuyanîkirin. Vêderê Kurdistan e û ji cihanê cuda ye!

Ji meha Çile ya sala 1981’an heta nîsana sala 1988’an bajar, gund û qesebeyên nava sinorên Îranê 242 caran rastî êrişên kimyewî ên dewleta Îraqê hatin. Kuştiyên êrişan bi qasî 44.000 kesan hatiye xûyanîkirin lê tevî ku dibe ku hejmara birîndaran ji sedan hezar kesan jî zêdetir be, ew jî miriyên zindî ne. Naveroka vê nivîsa min li ser gundiyên herêmeke Kurdistanê ye ku piraniya wan her roj tevî xweziyên ji mirinê re dijîn.

Ji dema ku li cîhanê çekên kîmweyî ketine gera şer 500.000 kesan jiyana xwe wenda kirine û bi milyon kesan jî kirine qurbanî.





**Êşek bêdawî**

Dawiya havînê û roja 21’ê tîrmeha sala 1988’an bû. Êşek wek êşa Hîroşîma, Nakazakî û Helepçe weke barana mirinê bi ser jiyana xelkê gundekî herêma Dalaho de jî barî. Şerê du dewletan di fermiyetê de bidawî bûbû. Lê germahiya rojên dawiyê ên şerê du aliyan bi qasî agirekî berfireh herder girtibû. Roja 26.07.1988’an operasoyana Mêrsad jî ji hêla rêxistina Mucahidînê Xelq ve hat destpêkirin. Destpêka şerê wan jî bi piştgiriya artêşa baasiyên Iraqê ji Mêhran û Kirmaşanê bû. Rêya çûyîna derveyî gund bo bajarê Kirmaşanê hate girtin. Kes nizane di wan rojên tengaviyê de çi hate serê wan. Nalîn û kalîna zarok, pîr, kal, ciwan û mezinan digihîşt erşê esmanê heftan.

Li welatê kurdan û li ser hisana tunekirina wan çend alî tevîhev ketibûn hisab û kîtaban.

Li wira hewzeke avê hebû ku jêre digotin ***“hewza ava Kewser”***, aveke zelal û derman ji êşên bêderman re jê diherikî. Êdî wê rojê ew hewza dîrokî jî bûbû jehra jiyanê. Kaniyên zelal ên pişta gund jî wê rojê tevî senaryoyê bûbûn, dostên xwe yên salên dirêj dikuştin. Roja qiyametê bû. Mirov, sewal, çûk, kuçik, masî, kêz û morî…, tev weke gihayê ku bikeve ber devê tirpanê, diketin xewa mirinê. Hingî bû ku mezinên gund zanîn ku gundê wan bi bombeyên kîmyewî hatiye bombekirin kirin. Zarokên delal êdî digotin: ***“Laşê min dixurê, qirika min dişewite, çavên min diêşin, êdî nikarim bilîzim babo, dayê ev çi bêhna sêvan e tê?...”***

Dayikek bi çavên tije hêsir wiha dinalîne: ***“Ji wê rojê û şûnde hemû dilxweşiyên ji jiyanê re hatine dawiyê. Di çar werzên salê de jiyan weke hev an jî rengê hebûnê hatiye guherîn, em miriyên ser pêyan e. Xwezî miribûma, ev ne jiyan e birako. Piştî ewqas salan welehî êdî hêza madî jî tune ye ku dermana bikirim…”.***

Hemû kêliyên rojên şer weke kabusekê li ber çavên wan in.

**Hêsirên ji xwîna dil**

Keziyên wê yên perîşan hema bêje rewşa îro ya jiyanê ya li rû erdê dida nîşandan. Ciwanî û hestên hezkirinê hema di bihara jiyana wê de miribûn. Axînek kûr kişand, tevî barandina hêsirên ji xwîna dil behsa wan rojan kir. Êdî hilhatina rojê weke sal û rojên berê jê re xwedî wate nebû. Hingî heza ji jiyanê xwedî hezar tehmên ji hev cuda bû, lê piştî wê rojê êdî xweziya wê a herî mezin mirin bû. Ew roj ji bîra wê naçe. Havîna sala 1988’an bû. **Ajîra** xeterê dil û hilm di singan de sekinandin. Dîsa dê ji hêla kê bombe bi ser serê kê de bêne barandin? Destê xwe avête çarstûna deriyê malê, destê kurê xwe guvaşt û dengê bombeyan qêrîn û hawar jî zû fetisandin. Rengê avê û tehma wê hatibû guherîn.

Roja înê, roja xêrê bû, saet 6’ê li ber sibehê, her kesî xwe amade dikir ku ber bi karê xwe yê derveyî malê here. Vehesîn ji gundiyan re bêwate ye. Lê ew în berevajî yên beriya xwe malwêranî û qedereke din a tije reşahî tevî xwe anîbû. Êdî Neşmîl heta ji vehûnandina porê xwe yê dirêj û keziyên xwe jî bêzar bûbû. Li derdora xwe dinihêre û rûrastane wiha dibêje: ***“Êdî ji jiyanê bêzar bûme, ka mirinê tu li ku yî?...”***







**Şerê bêdawî!**

Piştî bidawîhatina şerê Îran û Iraqê û pejirandina biryarnameya 598’an a ji hêla Îranê ve her du aliyan ji du aliyên sinorê rojhilat û başûrê Kurdistanê dest bi bombekirina gund, qesebe û bajarên nava sinorên xwe kirin. Armanca du aliyan ew bû ku li ser maseya hevdîtinan daxwazên xwe bi hev û din bidin pejirandin û sepandin. Gundê Zerde tevî siruşt, xaniyên xwe yên kevnar, dar û gihayên ku xemla wira delaltir kiribû, yek ji sedan gundên Kurdistanê bû ku hate bombarankirin. Feqîrî, nedarî, paşdemayîn û jiyaneke bêser û ber li ser der û dîwarên malên nava gund diyar bû. Jin an mêr tev razî bûn ku pariyekî nanê keda destê xwe ya rojane bixwin. Zerde gundekî girêdayî herêma Dalaho roja înê ji hêla çar balafirên dewleta Iraqê ve bi bombeyên kîmyewî bû dojehek bêdawî. Bombe bi ser ava gund de barandin. Tevî pelên daran, çûk jî ji esman ber bi erdê ve dibarîn. Mirîşk, mer û malat, tenê mirin bû ku wê rojê li erd û esmanê gund dibarî. Hilma jiyanê sekinî, pîr, zarok, ciwan, keç, ji tevan re weke hev bû. Hinek kerr bûn, hinek rastî kanserê hatin, yên din jî ji pêya ketin hindî ji bo dermankina xwe ber bi Kirmaşanê û Tehranê ve biçin. Wê rojê 220 kes birîndar bûn û 47 kes jî hatin kuştin.

**Em sê kom bûn**

Mam Ciwanmerd li lawê xwe yê 35 salî dinihêre û wiha dibêje: ***“Zanyar hingî nûciwan bû. Liv û lebata wî ji jiyanê re weke barana destpêka biharê bû. Piştî wê roja herî nexweş êdî zimanê wî û gelek zarokên din ji kar ket, kes nedikarî biaxive, ne bibihîze, rehên dil êdî kar nakin, bêdeng, bêhêvî û têrbûyî ji jiyana ku nemirovan kirin para me…”.*** Nûciwanek bi qasî siruşta welatê xwe delal û zana bû. Şev û rojê dixwend ku rojekê piniyên destê bavê xwe yê cotyar derman bike. Karekî bike ku qermûçkên eniya dayika wî a pîr û zehmetkêş ji bihîstina serkeftina wî saf bibin. Lê niha li pey rêyekê digere ku hinek êşa çavên şewitî, qirikên tije êş ku hilmê nakişînin, ser êşî û sinirên tevlîhev, kêm bike. Rewşa ku êdî ew ji jiyana civakê veqetandine. Dilxweşiya wan ji mayînê re tune ye, her deqeyê ji xwedê dixwazin ku dawî bi wê jiyana wan a tije êş û elem bîne.

***Dema behsa wan salên nexweş dikin, zilamekî navsere wiha dibêje:” Em sê kom bûn:***

✓Koma yekê ewên herî bextewar ku şehîd bûn,

✓Koma du yên ku ketin bin siya piştgiriya dewletê û hevkariyê distînin.

✓Koma sê ya bexterşan ku di roja tengaviyê de hevkarî kom kirin, birîndar derman û laşê kesên şehîd jî veşartin. Xwezî hema bi wan re û di wan kêliyan de em jî miribûna.”

Jiyana wan weke mînakek biçûk a jiyanê li Kurdistana dagirkirî rastî wê rewşa kambax hat. Ji hêlekê Mucahidînê Xelk û ji hêla din jî bombebarana dewleta Iraqê bextreşiyeke bêdawî kirin para wan. Kêra bijîşkên cerah jî nekarî dawî li derdên bêderman bîne. Piştî salên dirêj hîn jî zarokên mirî têne dinê. Ew nikarin bipejirînin ku êdî nikarin bijîn. Ji wê rojê û şûnde dar hişk bûn, tevkujî kete nava xwezayê û jiyan sekinî. Kes nikare behsa wê êşê bike, êşeke hezar reng û bêdeng, bênasname û kes nizane çi nav lê bikin.

Dermanên giran û bêkarî bûne sedem ku êdî ew dev ji xwe berdin. Îşkenceyên êşên giran saniye bi saniye laşê wan diguvêşin. Kanser bûye mêvanê canê jinên ciwan û qêrîna wan wiha didome: ***“Ev ne jiyan e, mirinê ka tu li ku ma yî?”***

**Dadgeha Laheyê jî nebû hevkar**

Zerde gundek ji axê, di nava çiyayên Dalaho de ku dema ji dûr ve tê ber çavan, delal û cihwarê jiyanê ye, lê rastî tiştekî dike: xwarinên ji goştê sewalan, geya û pincarên çiya jî êdî bersivê nadin û carana bi xwarina wan re gundî rastî nesaxiya “birîna reş” jî tên.

Di dadgeha Laheyê de şehadeta çend kes ji wan li dijî kesên ku madeyên kimyewî dane Sedam, belgeyên herî bihêz bûn. Tevî selmandina hemû rastiyan kes li ser zirar û ziyanên wan nesekinî.

Şahidekî ji serokê dadgehê re wiha gotibû: ***“Ger rojekê kesek çavên te ji te bistîne û te kor bike, tu yê çi bi wî bikî dema ku diveke ber destê te?”***

Hingî tenê nêrînên tije şermizariyê bûn ku pirsên bêbersiv dabûne hev.

Di dirêjahiya dîrokê de piraniya mirovên rû erdê ji destpêka jiyana li rû erdê heya niha berdeyên “mal û hêzê” bûne. Sulatanên adil û dadmend bi van du tiştan bûne dîktator, fermandar bûne padişah û piştre her tiştek ji bîr kirine û bûne otorîterên kuştina jiyanê. Mînakên ji bo vê rastsiyê gelek in. Sedam Husên bi van mereman hat û çû.

Serok Ocalan li ser hebûn û dubare jiyaneke tije rûmet li Kurdistanê wiha dibêje: ***“Dîrok di roja me ya îro de û em jî di destpêka dîrokê de veşarî ne…”***

Û belê em dikarin nehêlin ku destpêka dîroka me bi xwînê û destê xwînrêjan ve bê nivîsandin.